| | |
|---|---|
|  *Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)* |  *wergera ji erebî: Mustefa Reşîd* |


# Tîrêjên Çarşembê

**Xelek - 4**

# Mîra Mîttannî Nefretîtî bû Padîşaha Misirê

## Dijberiyên geo-siyasî:

Peywendiya Kurdan bi Misirê ra gelek kevine. Ev peywendî ne tenha li ser navên hin navdarên Kurd li Misirê radiweste wek wêjevan *Ehmed Teymûr*, bîrdar *Qasim Emîn*, helbestvan *Ehmed Şewqî*, bîrdar û wêjevan *Ebbas Mehmûd El-Eqqad* û gelek kesên din. Ne jî ev peywendî ji dema malbata Kurd *Mihemed Elî Paşa* da ye ku ji sala 1705-an heya 1953-an serdariya Misirê kirine û ne jî ji dema malbata *Kurdên Eyyûbî* da ye ku di navbera 1171-an û 1250-î da serdarên Misirê bûn.


Peywendiya Kurdan li gel Misirê hên vedigere dor nîveka hezarsala duwem ya b.z., dema ku du padîşahiyên pêşiyên Kurdan li tenişt hev xwedî desthilat bûn û peywendiyên wan yên zavatiyê li gel Fer'ewnên Misirê hebûn.

**Yekem - Padîşahiya Kaşşû (Kassît):** Vê padîşahiyê serdarî li nawend û başûrê Îraqa niha dikir ku paytextê wê bajarê Babil bû. Ji *Kaşiyan* ra "*Kassite*" jî tê gotin. Warê wanî resen Loristan bû. Ew li gor xwedawendê wanî mezin "*Kaşşû (Kashshu)"* bi vî navî hatine naskirin. Bi gelemperî siyaseta padîşahên kaşşî li gel dewletên cîran siyaseteka aştiyane bû.

**Duwem - Padîşahiya Mîttanî (Mittani):** *Mîttanî* şaxekin ji *Horiyan (Xûrrî, Ĥur-ri ).* Ev nav wek *Horî* jî tê bilêvkirin. *Mîttanî* bêhtir dor salên 1500-î b.z. hatine xuyakirin. Wan padîşahiyên Horiyan yên cuda di çarçewa yek dewletê da kirin yek û paytextê wan bajarê *Waşûkanî (Washukanni)* bû, li rojavayê Kurdistan, li nêziya Serê Kaniyê. Ev padîşahî ji piraniya herêmên başûr, nawend û rojavayê welatê Kurdan pêkdihat. Di dema geşbûn û firehiya xwe da axa wê ji bajarê Nûzî (li

nêziya Kerkûkê) da heya bi kenarên Derya Sipî bû.

Li dor sala 1450-î b.z. *Padîşahiya Mîttanî* digihîne asta xwe ya here bilind. Di wê demê da çar padîşahiyên din li rojavayê Asiyayê hebûn: *Padîşahiya Kaşşû* li nawend û başûrê Îraqa niha, *Padîşahiya Aşûr* li ser axa *Sobartu* (beşê bakur û rojava yê herêma başûrê Kurdistanê ya niha). Ew di wê demê da hên lawaz bû û ser bi *Padîşahiya Mîttanî* bû. Ya sêhemîn *Padîşahiya Hitîtan* li bakurê Anatoliyayê bû û ew jî hên lawaz bû. Ya çaremîn *Padîşahiya Misirê* bû ku di heyama malbata padîşahî ya heyştdehan da, hên ji destpêka hezarsala duwen b.z. da bi hêz bûbû û axa wê digihîşte heya nawenda Sûriyaya niha.




*Padîşahiya Fer'ewnên Misirê* - daku berjewendiyên xwe yên bazirganî bi aliyê rojhilat da bi ewle bike - hewlda ku herêmên Filestîn, Libnan û Sûriyayê têxe bin kelîja xwe; ew herêmên ku di wan ra rêyên hevrîşim û pixûrê yên bazirganiya cîhanî derbas dibûn û ji hev dikişiyan. Ji ber ku nîvê bakur ji axa Sûriyaya niha di bin kelîja *Padîşahiya Mittanî* da bû, ji lew ra, dijberî di navbera wan û Misirê da pêkhat. Fer'ewnê Misirê *Tiĥûtmûsê Yekem* (1528-an û 1510-an b.z.) êriş anî ser Sûriyayê û gihîşte sînorên *Padîşahiya Mîttanî*. Ev bûyer di dema padîşahê duwem yê Mîttaniyan *Şûttarnayê (Shuttarna) Yekem* da bû.

*Fer'ewn Tiĥûtmûsê Sêhem* (1468 - 1436 b.z.) bêhtirî şanzdeh caran êriş anî ser herêma *Rîtîno* (nawenda bakurê Sûriyayê) û pir caran di şer da li dijî padîşahê mîttanî *Sawşattar* kurê *Parsaşattarê Yekem* û padîşahiyên ku li gel wî hevpeyman bûn biserket. Lê tevî wê jî, *Padîşahiya Mîttanî*

careka din hêza xwe vedigerand û bi hevpeymanên xwe ra li dijî Misirê serî hildidan.


## Nefretîtî - Padîşaha Misirê:

Lê belê rewşa geo-siyasî li rojavayê Asiyayê êdî dihate guhartin. *Padîşahiya Aşûr* li rojhilat û *Padîşahiya Hitît* li bakur bi hêz dibûn û dixwastin ku ber bi Sûriyayê va fireh bibin. Fer'ewnê Misirê *Amûnĥûtebê Duwem* dûndayê *Tiĥûtmûsê Sêhem* dît ku ji berjewendiya Misirê ye aştiyê li gel Padîşahiya *Mîttanî* deynê û rabû axa Sûriyayê di navbera Misir û Mîttaniyan da parvekir. Bajarê *Qadiş* (li nêziya bajarê Humsê yê niha) bû sînorê navbera kelîja mîttanî li bakur û kelîja misirî li başûr. Di dema Fer'ewnê Misirê *Tiĥûtmûsê Çarem* û padîşahê mîttanî *Artatama* da di navbera wan da hevpeymaneka dostaniyê li dijî kelîja hitîtî pêkhat.


Bi dirêjahiya sê nifşan ev dostanî bi zavatiya navbera herdu malbatên padîşahî yên Misir û Mîttaniyan da hate bihêzkirin. Agahdariyên wisa hene ku dayîka Fer'ewn *Amûnĥûtebê Sêhem* mîttanî bû û ew bi xwe jî bi bêhtirî mîrekê ji mîrekên Mîttaniyan ra zewicî bû. Mîrekê ji van mîrekan ku navê wê Çîlo-Xîpa (Gulo-Xîpa) cihêzekî gelek giran û 317 hevalên xwe bi xwe ra anîn Misirê û piraniya wan b mezinên berpirsiyarên Misiriyan ra zewicîn. *Amûnĥûtebê Sêhem* ji kurê xwe û cihgirê xwe *Amûnĥûtebê Çarem (Exnatûn)* ra mîreka mîttanî bi navê *Tadû-Xîpa* anî û pêra zewicand. Ev mîreka mîttanî li Misirê bi navê *Nefretîtî* hate naskirin ku tê maneya "ya bedew hat". Ev keça padîşahê mîttanî *Şûttarna* bû.

Di navbera dîroknasan da li ser çespandina navên Fer'ewnan û mîrekên Mîttaniyan da yên ku pêra zewicîbûn cudahî heye. Belkî ev vedigere ser wê yekê ku navên wan mîrekên Mîttaniyan pir dişibihin hev û ji ber ku hin Fer'ewn li gor adet û xweriskên wan bi jinbavên xwe ra jî zewicî ne. Gava em dema serdariya wan Fer'ewnan û dema serdariya padîşahên Mîttaniyan didin ber hev, em digihînin wê encamê ku zavatiya wan bi vî awayî bûye:

- Zewaca *Amûnĥûtebê Duwem* li gel keça *Sawşatar* (xwîşka *Artatamayê Yekem* û meta *Tûşrata*) navê wê ne diyare.
- Zewaca *Tuĥûtmûsê Çarem* li gel keça *Artatamayê Yekem* ku navê wê "*Çîlo-Xîpa* yan jî *Gulo-Xîpa*" ye û ew xwîşka *Tûşrata* ye.
- Zewca *Amûnĥûtebê Sêhem* li gel "*Tadû-Xîpa*" (dibe ku keça *Tûşrata* be.
- zewaca *Amûnĥûtebê Çarem* (*Exnatûn*) li gel *Tadû-Xîpa (Nefretîtî)* keça *Şûtarna*.



Ferewn Exnatûn



Padîşah Nefretîtî

Me di jêderan da agahdariyên temam derbarê piraniya mîrekên Mîttaniyan nedîtin. Hin agahdariyên biçûk derbarê mîra mîttanî *Tadû-Xîpa* hene ku li Misirê bi navê *Nefretîtî* hatiye naskirin. Bi giştî wisa tê xuyakirin ku asta mîrekên Mîttaniyan yên zîba û bedew li ba Fer'ewnên Misirê gelek bilind bû. Belge û nîşana vê yekê ewe ku Fer'ewn *Tiĥûtmûsê Çarem* kebaniya xwe ya mîttanî kiribû sereka jinên qesra xwe, li cihê ku Fer'ewnên pêş wî kebaniyên xwe yên din ji Asiyayê di radeya duwem da dihejmartin.

Bandora padîşaha bedew Nefretîtî li ser malxiyê xwe gelek pir bû. Jê heft keç anîbûn, lê ti xort ji bo cihgiriyê nebûn. Lê tevî wê jî, *Exnatûn* bi ti jinên din ra nezewicî, tevî ku li gor adet û zagonê ji wî ra rewa bû. Wî biryar dabû ku ji *Nefretîtî* ra dilsoz bimîne û pir navên bi teqil dabûn wê; wek "*Serdara Erdê*" (yanê serdara cîhanê). Evîna wî ji kebaniya wî û keçên wê ra hîşt ku ji adet û xweriskên fermî yên serweriya Misirê derkeve. *William Durant* dibêje:

"Ji heyama wî tabloyeka biçûk gihîştiye me ku têda tê xuyakirin ew padîşaha xwe hembêz dike. Wî ji wênesaz û peykerteraşan ra rewa kiribû ku wêneyê wî durist bikin, dema ew li gel kebaniya xwe û keçên wê di kolanan ra bi erebeyê diçin. Di rojên cejin û şahiyan da *Nefretîtî* her li tenîşta wî rûdinişt, bi destê wî digirt û li kêleka textê padîşahî keçên wê dileyîstin. Li ser kebaniya xwe digot ku ew serdara bextewarî û kamiraniya wî ye. Dibêjin ku dilê Fer'ewn pir şadibû dema dengê wê dibihîst û gava sond dixwar bi vî awayî digot: Bi qasî ku padîşaha min û

keçên wê dilê min geş dikin".



Exnatû û Nefretîtî bi zarokên xwe şadibin

*Exnatûn* ne Fer'ewnekî asayî bû, wî şoreşeka ayînî mezin li Misirê pêkanî. Wî perestina xwedayê tenha û yekane anî Misirê û nav lê kir "*Atûn*". Nîşana Xweda qaşa roja li esman bû. Wî li ser Misiriyan ferz kir ku dev ji perestina xwedawend *Amûn* ku nîşana wî gah (Îblîs) bû berdin û ji ber wê bi oldarên ayîna *Amûn* ra kete dijberiyeka pir tund û tûj. Wisa hatiye naskirin ku *Horî* (*Mîttanî* jî di nav da) ji alîgirên ayîna rojperestî (şemsanî) bûn. Wisa tê xuyakirin ku *Exnatûn* di bin bandora dayîka xwe û kebaniya xwe ya mîttanî da bû û wisa ayîna rojperestî anî Misirê. Helbet rola kebaniya wî *Nefretîtî* di vê mijarê da gelek xurt bû.

*Exnatûn* di sala 1362-an b.z. da wexer kiriye; dema ku temenê wî 30 sal bû û çarenûsa padîşah *Nefretîtî* piştî wî bi temamî ne diyare. Di agahdariyekê da hatiye ku wê demeka kurt piştî mirina malxiyê xwe wek Fer'ewn *Neferneferuaten* serdarî kiriye. Di agahdariyeka din da tê gotin ku ew bi nexweşiya Pirikê miriye ku di wê demê da li paytext *Tîbê* (Till-Emarna niha) belav bûbû.

Çarşemb, 22.04.2015

## Jêder:

1- Dr. Cemal Reşîd Ehmed: Zuhûr El-Kurd fî El-Tarîx, 1/606. Gernot Wilhelm: El-Horiyûn, rûpel 17. Muhammed Harb Ferzat, Id Mar'î, dewlet û şaristaniyên rojhilata erebî kevnar, rûpel 161. Abdulaziz Saleh, rojhilata nêzîk ya kevnar (Misir û Iraq), rûpel 561.
2- Gernot Wilhelm: El-Horiyûn, rûpel 59. Jean Potro û kesên din, rojhilata nêzîk - şaristaniyên

destpêkî, rûpel 201. Muhammed Harb Ferzat, Id Mar'î, dewlet û şaristaniyên rojhilata erebî kevnar, rûpel 165.

3- Abdulaziz Saleh, rojhilata nêzîk ya kevnar (Misir û Iraq), rûpel 226 - 227.

4- Taufiq Sulaiman, lêkolîn li şaristaniyên rojavayê Asiyayê ya kevin, rûpel 364 - 365. Gernot Wilhelm: El-Horiyûn, rûpel 61. Taufiq Sulaiman, lêkolîn li şaristaniyên rojavayê Asiyayê ya kevin, rûpel 365. Muhammed Harb Ferzat, Id Mar'î, dewlet û şaristaniyên rojhilata erebî kevnar, rûpel 166.

5- Gernot Wilhelm: El-Horiyûn, rûpel 64, 182. Ahmad Hibo, dîroka rojhilat ya kevin (Sûriya), rûpel 182.

6- Ahmad Fakhri, lêkolîn li dîroka rojhilat ya kevin, rûpel 44, 83. Muhammed Harb Ferzat, Id Mar'î, dewlet û şaristaniyên rojhilata erebî kevnar, rûpel 160.

7- Gernot Wilhelm: El-Horiyûn, rûpel 64. Dr. Cemal Reşîd Ehmed: Zuhûr El-Kurd fî El-Tarîx, 2/246, 255. Abdulhamid Zayed, rojhilata hemdem, rûpel 478 - 479.